Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1237 8-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Di du rojan de kilîpa ‘Yekîtî’ amade bû’

Hemza Sêvo/ Qamişlo

**Hunermend Yasîn Botan destnîşan kir ku armanc ji kilîpa ‘Yekîtî’ yekbûna gelê kurd e û wiha got: “ Erka yekbûna kurdan dikeve ser milê her kurdekî de. Ev kilîp ji aliyê 6 hunermendan ve di du rojan de hat derxistin.”**



Kilîpa ‘Yekîtî’ ye ji berhemên ku ji hêla hunermendên kurd li Rojavayê Kurdistanê ve hatiye çêkirin. Ev berhem derbarê yekrêziya kurdan li Rojava û tevhaya Kurdistanê ye ku di 2’yê Çile de hat derxistin.

Berhema ‘Yekîtî’ ji hêla Çîmen Osman, Hojî Hêris, Nisrîn Botan, Yasîn Botan, Danîş Botan û Hesen Dêrikî ve, bi derhêneriya Rumet Elî hatiye çêkirin.

Derbarê derxistina vê berhemê hunermend Yasîn Botan ku ew jî cihê xwe di nav kilîpa ‘Yekîtî’ de digire ji rojnameya me re axivî.

## ‘Di du rojan de kilîpa Yekîtî hat amadekirin’

Yasîn Botan da zanîn ku kilîpa ‘Yekîtî’ di du rojan de amade bû û wiha domand: “Li Rojavayê Kurdistanê bi awayekî lezgîn hewcedarî ji hejmarek hunermendan hat xwestin ku kilîpeke ji bo yekrêziya kurdî çêkin. Lewma jî di du rojan de kilîpa ‘Yekîtî’ hat derxistin, rojekê li Hunergeha Feysel Hesen hat qeydkirin û roja din dîmen li Navenda Mihemed Şêxo hat kişandin. Me weke 6 hunermendên kantona Cizîrê cihê xwe di nav vê kilîpê de girt û her yek beşekê ji stranê dibêje. Bi kemîreya Rojava TV, tevkariya TEV-ÇAND’ê, montaja Nefel Productionê, bexlemeya Şiyar Kîkî û bilûrvan Kawa Kalê ev berhem amade bû. Herwiha gotin û awaz ê Rumet Elî bûn. Di nav vê kilîpê de me navê tu partiyên kurdî an jî serokên kurdan bibîr nexist, lê tenê me daxwaza yekbûna mala kurdî kir.”

## ‘Armanc ji kilîpê, yekrêziya kurdî ye’



Botan anî ser ziman ku armanc ji kilîpa ‘Yekîtî’ yekdengiya gelê kurd e û wiha axivî: “Em weke gelê kurd di qonaxeke pir nazik û hestiyar re derbas dibin. Qonaxeke ku yan wê gelê kurd hevgirtî bin li Rojavayê Kurdistanê yan jî wê tune bibin. Îro li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê şervanên QSD’ê şerekî lehengî dikin û bi berxwedaniya xwe, destana dîrokî ya sedsala 21’ê dinivîsînin. Ew jî li benda yekîtiya gelê kurd in û şervanên me bi yekîtiya kurdî bihêztir dibin. Lewma jî yekîtiya kurdî di vê qonaxê de gelekî girîng e, ji ber ku dema hebûn û tunebûnê ye. Eger şoreşa me têk biçe ew ê hemû partiyên kurdî jî herin û em ê sed salên din li pêş bibin kole. Çiqasî pirsgirêkên partiyên kurdî hebin, pêwîst dike ku van nakokiyên di navbera xwe de bidin hêlekê. Herwiha gelê kurd li Rojava ji vê qonaxa hestyar derxînin û berê xwe bidin deriyê azadiyê.”

## ‘Erkê hevgirtinê dikeve ser milê her kesî’

Hunermendê kurd Yasîn Botan destnîşan kir ku henû kes erkdarên yekîtiya kurdî û wiha got: “Di roja îro de şervanên QSD’ê li hemû çeperên şer qehermaniyeke mezin dide meşandin. Kêmasî di milê şervanên me û hêzên leşkerî de tune ye. Lê belê kêmasî ji hêla ragihandinê ve tê kirin, nemaze ev berxwedaniya ku tê kirin bi awayekî ku tê xwestin, li ser asta cîhanê nayê ragihandin. Di heman demê de, me ev berhem bi ked û derfeta xwe çêkir, lê belê televizyonên me û dezgehên ragihandinê ev berhem neweşandin. Me tenê li ser malperên xwe yên civakî li ser watsap, feecbook, you tube û hwd… belav kir. Li aliyekî din rewşenbîr, nivîskar û hunermendên me li Rojava di warê piştgiriya QSD’ê û yekîtiya kurdî de kêm mane. Ew xebatekê dikin, lê ne biqasî giranbûna Şoreşa Rojava ye. Lewma jî pêwîste her kes ji bo yekîtiya kurdî û piştevaniya şervanên QSD’ê xebatê bike. Ji ber ku ev yek erkê hemû rewşenbîr, hunermend, siyasetmedar û partiyên kurdî. ”

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER BELA Û PIRSGIRÊKAN**

**Belaya wî ji xwe vekir:**
- Ji bo ku ji xwe dûr bixe tiştek dayê.

**Bû zeng û zîwan:**
- Bû benîşt bi me ve ma; bû belaya serê me; em jê xilas nebûn.

**Bela li xwe pêça:**
- Bela ji xwe re çêkir; bi destê xwe pirsgirêk ji xwe re derxistin.

**Bi qûnê ketiye kodika jajerûne:**
- Pirsgirêkeke mezin jê re derketiye; ketiye şehê xwe; nikare ji nava pirsgirêkan derkeve.

**Bi qûnê ketiye çala gênim:**
- Bi heman wateyê.

**Canê min zer kir:**
- Ez pir êşandim; serê min xist belayê.

**Ez ketim deravê wî:**
- Ez ketim balaya wî; ez ketim derîka wî; bi têkiliya wî re pirsgirêk ji min re derketin; bê xwestek ez bûm hevalê wî.

**Ez ketim tomika wî:**
- Bi heman wateyê.

**Ez ketim direka wî/ez ketim derîka wî:**
- Bi heman wateyê.

**Hesp li ser çar lingan diçe dîsa dişemite dikeve:**
- Çiqas mirov hay ji xwe hebe jî pirsgirêk derdikevin pêşiya mirov.

**Hêdîka diçim bela digihe min, zû diçim ez digihim belayê:**
- Ez çi dikim her tim bela tên serê min.

**Ji ber daye stû:**
- Nikare xwe jê rizgar bike; lê bûye bela; jê re bûye pirsgirêk.

**Jê reviyam lê aliyam:**
- Min kir nekir jê xilas nebûm.

**Kir belaya serê xwe:**
- Pirsgirêk ji xwe re derxistin.

**Mirov selika xwe bêtû jê naborîne tu libên tûyan jî diavêjiyê:**
- Mirovekî belakir e; cira wî ne xweş e; ne yê tevlîbûnê ye.

**Ser de çû/bi ser de çû:**
- Belaya xwe lê da; tişt jê xwestin.

**Ser xwe û bin xwe danî:**
- Belayeke mezin hat serê wî; her tişta xwe firot; tiştekî xwe nehişt.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



Bi kamîreya Argêş Vîyan

## ‘Rola ragihandina şerê taybet belavkirina agahiyên nerast e’

Edîtora Rojnameya Ronahî Sûzan Elî diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihandina şerê taybet kiriye dewrê û gelek agahiyê nerast belav dike da ku moralê civakê xirabike û gel teşwîqî revê bike.**R-4**



## Bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî têkoşîna gel didome

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê yek ji şoreşên herî girîng yên ku di Rojhilata Navîn de ji bo tevahî mirovahiyê hatiye destpêkirin. Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî tevahî pêkhateyan bê ferq û cudahî di nava xwe hembêz kir û parast.**R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1237 8-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S



## ‘Pêwîste jin serê xwe ji hişmendiya paşverû re netewînin’

Siyasetmedar Nicûda Faris diyar kir ku jin amade ye cihê xwe di siberoja Sûriyê de bigire û mafê jinên Sûriyê jî bi felsefeya Şoreşa Rojava tê parastin. Herwiha rojnamevan Evîn Yûsif da zanîn ku pêwîste jinên sûrî destê hev bigirin û serê xwe ji hişmendiya paşverû re netewînin.**R-2**

# KOMKUJIYÊN JINAN BERDEWAM IN Û KUJER NAYÊN DADGEHKIRIN

Di 9’ê Çileya 2013’an de li Buroya Enformasyona Kurdistanê ya paytexta Fransa Parîsê; sê jinên kurd, têkoşer û pêşengên Tevgera Azadiya Jinan bûn armanc. Yek ji damezrînera PKK’ê Sakîne Cansiz, nûnera KNK’ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez hatin şehîdxistin. Ev komkujî ji aliyê sîxurê dewleta Tirk û endamê MÎT’ê Omer Guney ve pêk hatibû. Tevî gelek bangan jî dewleta Fransa ser komkujiyê nixumandin û faşîsta Tirk heta niha nehatiye darizandin û komkujiyên li dijî jinan dewam dike.**R-5**





## Ji çiraxên hunera kurdî

Hunermend Yara Hebîb yek ji wan hunermendên ku bi rêya huner, stran û mozîkê hewlda ye ku nasnameya çandî û hunerî ya civaka kurdî biparêze. Wê karîbû bi ruhekî kurdiya resen hunerê çêbike û navê xwe binivîsîne di nav Civaka hunerî û stranbêjiya kurdî bi tîpên zêrîn.**R-7**



## ‘Zihniyeta ku HTŞ’ê li ser mezin bûye, nikare hemû pêkhateyên Sûriyê hembêz bike’

Kurdyar Dirê`î diyar kir ku aloziya Sûriyê û Rojhilata Navîn nayên çareserkirin heya ku pirsgirêka kurdan neyê çareserkirin û got: “Pêwîste Sûriyaye siberojê sûriyeyekî nenavendî be, em Sûriyeke demokrat û azad dixwazin.”**R-3**

**Li Sûriyê propoganda zayendperestiyê tê kirin**
Nehîr pale R-2



**Bapîrê xwe teqlîd nekin!**
Farûk Sakik R-5

**Hêza ku bi navê SMO tê zanîn girêdayî kê ye?**
Zekî Bedran R-5



**Derbarê siberoja Kurdan li Sûriyeyê rewşenbîran çi got?**
Kemal Necim R-7

# ‘Pêwîste jin serê xwe ji hişmendiya radîkal re netewînin’

Siyasetmedar Nicûda Faris diyar kir ku jin amade ye cihê xwe di siberoja Sûriyê de bigire û mafê jinên Sûriyê jî bi felsefeya Şoreşa Rojava tê parastin. Herwiha rojnamevan Evîn Yûsif da zanîn ku pêwîste jinên sûrî destê hev bigirin û serê xwe ji hişmendiya paşverû re netewînin.

**Navenda Nûçeyan**

Di dîroka Sûriyê de gelek sîstemên serweriyê desthilatdariya gelên Sûriyê kirine. Her hikumetekê bi şêwazê xwe desthilatdariya xwe li ser civakê û bi taybet li ser jinê kirine û jin bêmaf hiştine.

Lê bi saya Şoreşa 19’ê Tîrmehê jinê dikarîbû li Rojava û Sûriyê tevlî hemû qadan bibe û mafê xwe biparêze.

Lewmabi hatina hikumeta nû, piştî ruxandina rêjîma Beisê, metirsî li ser çewsandina jinan û mafê jinên sûrî bi hemû pêkhate û baweriyan heye.

Sedem ew e ku tevgerên xwedî fikrên radîkal hewl didin serweriya Sûriyê bixin destê xwe û wekî her demê jinê dûrî qadên rêvebirin û mafê wê bikin.

Derbarê heman mijarê Endama Meclisa Jinê ya PYD’ê Nicûda Faris û rojnamevan Evîn Yûsif ji rojnameya me re axivîn.



Nicûda Faris



Evîn Yûsif

**‘Mafê jinê bi felsefeya Şoreşa Rojav tê parastin’**

Nicûda Faris da zanîn ku mafê jinên Sûriyê û cîhanê tev di destê Şoreşa Rojava de ye û wiha got: “Em weke jin bi dirêjahiya 13 salan e ku li Rojavayê Kurdistanê li ber xwe didin û me destkeftiyên bi nirx girtin dest. Herwiha ev keda ku di şoreşê de tê kirin em pîroz dikin. Em dibînin jinê di qada leşkerî, siyasî, diplomasî, civakî û hwd…de xebatê dike û li ber xwe dide. Şervanên YPJ’ê îro li çeperên şer berxwedaniyeke dîrokî dimeşînin, lewma divê em piştgiriya hêza xwe bikin. Herwiha tînin ziman ku pêwîste jin ji bo parastina mafê xwe û destkeftiyên ku bi dest girtî, berxwedanî û têkoşîna xwe bidomîne. Di heman demê de tekez dikin ku li ser hîm û felsefeya Şoreşa Rojava mafê jinan tê parastin.”

**‘Bingeha jinê di siberoja Sûriyê de amade ye’**

Endama Meclisa Jinê ya PYD’ê Nicûda Faris destnîşan kir ku jin amade ne ku cihê xwe di rêvebirina Sûriyê de bigirin û wiha domand: “Hişmendiya van kesên ku îro cihê xwe di hikumeta Sûriyê de digirin, zelal e û dîroka wan jî baş tê naskirin. Ew nehatine ku mafê jinan biparêzin, lê belê dixwazin dîsa jinan bindest bikin. Herwiha dixwazin jineke li gorî hişmendiya wan, ser û rû girtî be. Lê em dibêjin ku jin îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî bingeh e. Bi dirêjahiya şoreşê re jî di hemû waran de xebat kiriye û dikare vê yekê bidomîne. Em tekez dikin ku jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê amade ne ku cihê xwe di rêvebirina Sûriyeke demokrat û azad de bigirin. Di heman demê de jî daxwaza me ew e ku hemû jin, asta têkoşîna ji bo mafê xwe bilind bikin.”

**‘Rêveberên hikumeta Demkî, xwedî fikrekî islamî-radîkal in’**

Evîn Yûsif destnîşan kir ku rêveberên hikumeta Demkî xwedî hişmendiyeke islamî-radîkal in û wisa axivî: “Bi hatina hikumeta Nû ya Demkî re û serweriya van kesayetan hin nerazîbûn ji hêla mijara mafê jinê û xebata ku dike, derket holê. Wekî em dizanin ku ev aliyê serwer xwedî fikrekî islamî û radîkal in. Herwiha dîroka wan naskirî ye, em dizanin têkiliya wan bi Rêxistina Elqaîde re hebûn. Dema ku ew derketin ser ragihandinê mixabin jin weke aktereke bêhêz pênase kirin. Di heman demê de anîn ser ziman ku ji bilî hin karên biçûk jin nikarin tu karan bike. Di encamê de jî nerazîbûneke di kolana Sûriyê de çêbû, ji ber vê yekê jin daketin qadan û dan tekezkirin ku ew dikarin hemû karên ku mêr dikin, ew jî bikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jinê xwe di hemû waran de isbat kir, ev yek jî nimûneyeke herî baş e. Divê em ji bîr nekin ku li ser destê jinan, DAIŞ têk çû, li aliyekî din ku jin li îro di hemû dezgehên Rêveberiya Xweser de xebatê dike.”

**‘Pêwîste jin qebûl nekin ku dîse bindest bibin’**

Rojnamevan Evîn Yûsif diyar kir ku pêwîste jin qebûl nekin ku dîse bindest bibin û wiha bi dawî kir. “Di dema heyî de pêwîste ev hikumeta Nû baş têbigihêje ku xebat ne têkildarî fîzîkî û biyolojî an jî teşeyê jinê ye, lê belê girêdayî vîn, karîn û hişmendiya jinê ye. Di heman demê de pêwîste hikumeta Sûriyê ya nû dûrî sîstema cîhadîst û radîkal bikeve, hem jî li daxawzên civakê guhdar bike. Ji bo ku ev biriyarên wan nebe sedema tevlîheviyan û parçekirina civakê. Li aliyekî din jin xebata ku dike bidomîne û qebûl nekin. Ji ber ku eger ev yek pêk were wê jin 5 hezar sal vegere paş û wê di serdemeke tarî de bijî. Lewma jî pêwîste hemû jinên Sûriyê destê hev bigirin û banga bicihkirina mafê xwe di destûrê Sûriyê de bikin. Hem jî divê jin doza mafê xwe bikin û bi hûrbînî xalên girîng ji bo xwe zelal bikin. Di heman demê de gereke jin ji ber tirsa hişmendiya van kesên radîkal xwe nede paş, lê belê li hemberî vê yekê divê jin xwe di hemû waran de li pêş bixe.”

# Ev hê lê lê ye, hîna lo lo maye



**Nalîn Dîcle**

Gelên Sûriyê 15’ê Adara 2011’an di demeke ku bayê bihara azadiyê li herêmê serwer bû de, destpêkê jin û hemû kesimên azadîxwaz bihêviya guhertina rêveberiya dîkdator a Baas’ê û ji bo avakirina rêveberiyek demokratîk serî hildan. Lê mixabin bi destwerdana hêzên derve raperîna Sûriyê, bi destwerdana komên cihadîst ên girêdayî hêzên derve, herêm veguherîn qonaxeke şerê wekaletê yê demdirêj. Di encama vî şerî de li suriyê malwêranî , koçberî, xizanî, komkujî, her cûre binpêkirinên mafan serwer bû. Ger gotin di cih de be; mirin nîşan dan û xwestin bi tayê bidin razî kirin.

Dawiya dawî di 8’ê Kanûnê de rêjîmeke dîkdator a Baas’ê ku rizandineke mezin dijiya, hilweşiya. Bi hilweşîna vê rejima dîkdator re her çend hêviyên avakirina sûriyeyek nû geş bibe jî, lê kiryarên Heyet Tehrîr El Şam(HTŞ) yên heta niha ev hêvî çilmisand. Hîna mehekî desthilatdariya HTŞ’ê tije nebûye, fikarên ku di siberojê de wê xelk xweziya xwe bi Rêjîma Esad bîne çêbûye. Bi taybetî kiryarên hovane yên li ser pêkhatiya Elewiyan, tirsa ku heman kiryar li ser pêkhatiyên din jî wê bêne kirin serwer e. Li aliyekê tirsa ewlekariya can û mal, li aliyê din jî her diçe xeteriya li ser siberoja Sûriyan zêdetir dibe. Destpêkê Colanî ji bo xwe bide pejirandin her çend peyamên nerm dabe jî, lê bi daxuyaniya xwe ya herî dawî diyar kir ku heta 4 salan hilbijartin nîne. Desthilata cihadist a selefî, di nava van 4 salan de dixwaze hişmendiya xwe rêxistin û vesaz bike û wiha desthilatdariya xwe mayinde bike. Rewşa heyî nîşan dide ku pêvajoyek kaotîk, xeter li pêşiya gelên sûriyê ye. Dîsa ruxmê ku hîna guhertina zagon û makezagona Sûriyê nehatiye çêkirin jî, lê ji niha de HTŞ’ê ya cihadîst destwerdana minhacên perwerdê kir. Di ferman nameya ku ji aliyê HTŞ’ê ve hatiye weşandin de, bi guhertina minhacê pergala perwerdê ber bi pergaleke cihadîst ve dibe. Bi van guhertinan, hem pergala perwerdê ji zanistê dûr dixe, ber bi hişmendiya olperestî, mezhebperestî ve dibe. Bi guhertina minhacê, bi feraseta dîrokek yekalî wê nifşekî tundraw a ji zanistê dûr bide çêkirin.

Desthilata HTŞ’ê bi destwerdana minhacan herî zêde jî, guhertinan di elehê jinê de dide çêkirin. Dersên dîrokê bi meyzandineke zayendperest tê guhertin, xwedavend û keybanoyên ku mohra xwe li dîroka Suriyê û şaristaniya herêmê dane, ji minhacan têne derxistin. Mînak; Keybanûya Palmîrayê Zenûbiya ku împaratoriyekî ku rikbera împaratoriya Romayê ye, bi rêvebiriye, ji minhacan hatiye derxistin. Jixwe ev destwerdana minhacan jî nîşan dide ku deshilatdariya HTŞ û hemû cihadîstên mîna wê ji bo hemû jinan, pêkhate, çand û baweriyên cûda xeteriyeke mezin in. Hîn di destpêka desthilatdariya xwe de bi guhertinên di minhacan de çêkirîn, mêrperestî, olperestî û mezhebperestiya xwe nîşan daye. Dîsa hîn ji niha de destwerdana şêwazê jiyana xelkê herêmê û bi taybetî jî ya jinan tê kirin. Bi hişmendiya şerîatê, lixwekirina çarşefên reş li ser jinan tê ferz kirin. Desthilatdariya HTŞ’ê ku hîna tam hakim nekiriye ger van ferzkariyan dike, di demeke ku hemû kontrol bixe destê xwe, wê li ser jin û pêkhateyan ferzkariyek çawan bike, texmîn ne zehmet e.

Ev rûdan hemû nîşan didin ku di rêveberiyek selefî ya tundraw de ne jin, ne jî tu pêkhate, mezlep û bawerî, çand xwe di ewlehiyê de nabîne. Ji ber wê jinên ji hemû pêkhateyan, hevkarên hev yên stratejîk yên îro û siberojê ne. Jixwe ev hişmendiya tundraw bi avakirina bereyek berfireh a Sûriyan encex dikare bê berteref kirin. Suriya nû ya demokratîk û azadîxwaz jî encax, bi naskirina mafê jin û hemû nasnameyên kolektîf pêkane.

## Ji Pênûsa Jin

**Li Sûriyê propoganda zayendperestiyê tê kirin**

Nehîr Pale

Piştî 8`ê Kanûnê 2024`an sîstema Baas hilweşiya û HTŞ derbasî bajarên Sûriyê bû, êdî li hemberî jinên Sûriyê yên ku ciyê xwe di nava şoreşê de digrin û dest bi hemleyekê hat kirin.

Gelo wê dîsa hemû pirsgirêkên civakî bi jinê ve bidin girêdan? Cil, deng û rengê jinê sedema hemû pirsgirêkên xwe bibîn in? Hîna nediyare wê Sûriyê bi kîjan sîstemê were birêvebirin, lê belê li bajarê Şamê, Heleb û Himsê li hemberî şoreşa jinê ku bi silogana `Jin, Jiyan, Azadî` berdewam dike, dest bi propeganda zayendperestiyê kirin e. Li gorî diyar dibe wê rê û rêbazên zayendperestî û olperestî li ser jinê werin ferz kirin. Jina ku ciyê xwe di siyasetê de digre, xwe birêxistin dike, bi sîfeta şervan, fermandar, şoreşger têdikoşe wê kafir were îlan kirin. Çawa li Îranê ji bo jinê saziya polîsên exlaqî hatiye ava kirin, li Sûriyê jî heman rêbaz hatiye bikar anîn. Destpêkê saziya polîsên exlaqî vekirin, piştre brûşûrên ku jina serê wê vekiriye kafire belav kirin û pîvanên jina biçe buhuştê diyar kirin. Li gorî nêrîna van guropên propaganda zayendperestiyê dikin, jina biçe buhuştê wê li gorî pîvanên çeteyên DAIŞ`ê ji jinê re diyar kiriye, tevbiger e. Ango jina gotina azadiyê bikartîne gunehkare, jina li hemberî tûndiyê dengê xwe bike ew bê namûse û şerefa malbat û êla xwe gemar dike, jina daxwaza hebûna xwe dike ew ê bibe dijminê dewletê, wê ji hemû aliyan ve nefesê li jinê teng bikin û têxin bin pencên mêr de. Êdî jina ku xizmeta mêr dike, dengê wê nayê bihîstin, hebûna wê ne girînge ji aliyê dewletê ve were qebûlkirin û biçe buhuştê. Ev tê wateya mêr wê diyar bike kîjan jin biçe buhuştê yan jî kafire û dibe biçe dujehê.

Zayendperestî û olperestî tê wateya polîtîka inkar û imhayê li ser jinê dayîna meşandin. Di bin navê ol de wê têkoşîna jina Sûriyeyê ya 13 salan were imha kirin. Li hemberî sîstema hevserokatî wê sîstema navendî ya mêr were ferz kirin. Heyanî ji destê mêrê desthilatdar were wê dawî li hebûna jina Sûriyeyê bîne. Ji niha ve hewl tê dayîn ku zemînê sîstema navendî û dewleta Islamî were amade kirin, ev yek jî bi destê jinê tê kirin. Li bajarên Sûriyê mîna Hema û Helebê jin diçin kolan bi kolan digerin brûşûr û cilên reş li jinan belav dikin. Ne tenê li ser jinên Misilman belav dikin, li ser jinên Xiristiyan jî têne belav kirin.

Sîstema ku li ser bingehê zayendperestiyê nêzî jinê dibe, çareseriyê naxwaze, di tûndî, destdirêjî û kuştina jinê de israr dike. Ev sîstem wê ne polîtîk û exlaqî be, wê dûrî edalet û wekheviya di navbera jin û mêr de be. Eger ji niha ve navê qralîça Palmîra Zenûbiya ji meteryalên xwendinê yên dibistanan hatiye rakirin, ev tê wateya wê dîroka Sûriyê bi destê mêr were nivîsandin û navê jin di dîrokê re derbas nabe.

Jinên Sûriyê ji destpêka şoreşa Sûriyê ve dest bi têkoşînê kirin. Di têkoşînê de bi sedan jin canê xwe feda kirin, li ber xwe didin û têdikoşin da ku dawî li feraset û zîhniyeta mêr bîn in. Eger jinên Sûriyeyê xwedî li vê têkoşînê dernekevin wê hemû nirxên ku tevger û artêşa jin avakirine ji destê wan biçe.



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Yara Hebîb xwedan dengekî xweş û hestek nazik .Jina Kurd xwedî dîrokeke kûr a lehengî, xwebawerî û çandê ye û di avakirina civakê de xwedî roleke sereke ye, ji demên kevnare ve jinan mohra xwe li dîrokê xistiye û îsbat kiriye ku ew afirînera şaristaniyan, perwerdekar in ji nifşan re, û sedema sereke ya parastina ziman û çandê ye, keda ku jinan di warê ziman, wêje, huner û muzîkê de pêşkêş kiriye hêjayî pesindanê ye.

Hunermendên jin ên Kurd bi huner û afirîneriya xwe di parastina çand, huner û nirxên gelê Kurd de û di gelek warên jiyanê de rolek mezin lîstine, di hinek waran de ji mêran zêdetir serketine û Jinên Kurd jî weke hilgirên çanda Kurdî û parêzvanên kevneşopî û edetên Kurdan tên dîtin, Jinên Kurd ji bo parastina mîrata çandî ya Kurdî û gihandina wê ji bo nifşên paşerojê kedeke mezin didin.

Hunermend Yara Hebîb yek ji wan hunermendan e ku bi rêya huner, stran û muzîkê hewl da ye ku nasnameya çandî û hunerî ya civaka Kurdî biparêze û karîbû bi ruhekî Kurdî ya resen hunerê çêbike û navê xwe binivîsîne di nav Civaka hunerî û stranbêjiya kurdî bi tîpên zêrîn.

Hunermend Yara bi şiyana xwe ya hunerî ya binavûdeng nîşan daye ku huner ne tenê xweşîbir û şahiyek ji bo mirovan e, lê ew navgînek bihêz e ji bo belavkirina hişyariya neteweyî û bihêzkirina xwemaliya çandî ye. Hunermend û stranbêja Kurd Mehbûbe Hebîb bi nasnavê hunerî (Yara Hebîb) di sala 1979’an de li gundê Sincaqa Seadûn ya girêdayî bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê, paytexta nivîskar û helbestvanan, navenda folklor û mîrata kurdî ya resen, çavkaniya hunermend û dengbêjên kurd, ji dayîk û bavên Kurd (Ebdul Rahman Hebîb û Xelfa Elî) hatiye dinya yê.

Yara di malbateke Kurd a welatparêz de ku bi ruhê welatparêziyê tije, dilbêj û xemkêşê huner, çand, xembarê welat û nasnameya neteweyî mezin bûye.

Xwendina qonaxa seretayî li gundê Sincaqa Saedûn û asta amadeyî û lîse li dibistanên bajarê Amûdê xwendiye, lê ji ber rewşa siyasî û zextên ewlehiyê xwendina xwe bidawî ne kiriye. Meyla wê ya hunerî û hezkirina wê ya ji bo stranbêjî, muzîka kurdî û folklora kurdî di temenekî biçûk de, dema ku diçû dibistana navîn, di bin bandora bavê xwe ku stranên kurdî yên resen ên gelêrî digotin û xwedî dengekî xweş bû dest pêkiriye.

Li gel şert û mercên dijwar û astengiyan jî serê xwe netewand û weke jineke azadîxwaz û hunerhez di qada huner û çandê de xwe pêş dixist, roj bi roj bi ezberkirina gelek stranên folklorî û netewî yên li ser welat, hevgirtin, azadî û axê, şiyana xwe ya hunerî hîn zêdetir pêşdixist û hewesa wê ya ji bo stran û muzîka Kurdî zêdetir dibû.

Ew bi dengê xwe yê nazik û bi rewaha xwe ya xweş di nav xwendekar û kesên nêzî xwe de navdar bû, bêyî ku serî li ber zilmê daxîne wê hunera xwe hembêz kir û ber bi ronahiyê ve meşiya, ji ber wê jî di sala 1992’an de tevlî koma Bahdîna bû û rolek girîng di wê de lehîst.

Wê di sala 1994’an de bi tevlîbûna koma Agirî dest bi kariyera xwe ya hunerî kir û beşdarî gelek çalakiyên neteweyî, şahiyên herêmî û cejnên Newrozê bû.

Di sala 2005’an de hunermend, helbestvan û derhênerê Kurd Zakariya Efrînî nas dike û bi hevre dizewicin û sê keç ji wan re çêdibin (hunermenda ciwan Firîşte û du keçên jêhatî Surişta û Buhişta).

Hunermend Yara demeke dirêj bêhna laşê zarokên kizirîn yên di sotgeha Sînemaya Amûdê, kevnartiya şûnwarên Orkêş û henasa dîroka wê di bîra xwe de hiştine.

Wê karîbû bêhna pêmayên (xirbeyên) Amada û Şermola bi bêhna nîşangehên Nebî Horî û En Dara re tevlîhev bike û bêhna şaristaniya Girê Mozan û Şixar Bazarê bi bêhna Bendava Meydankê û kevnartiya Şikefta Doderî re bike yek, û bîhna Deşta Simbilan bi bêhna şaxên zeytûnê tevlîhev bike, bi stranên xwe yên xweş, bi hestînên xwe yên xurt û bi hestên wê yên nazik .Ji berhemên deştên Simbilên genim li Cizîra Keskîn û zeviyên çiqilên zeytûnan li Çiyayê kurmênc, sê gulên bedew (Firîşta, Surişta û Buhişta) li çarmedorên Rojavayê Kurdistanê derketine holê .

Şarezayiya wê tenê bi stranbêjiyê re sînordar nebû, ji ber ku wê li ser muzîkê dixwend, bi zimanê kurdî helbest dinivîsand, gelek awazên stranan çêkirine û bi zaravayê soranî jî stran gotine, ew niha amadekariya dîwaneke helbestan a bi zimanê kurdî dike ku tê de gelek helbest hene û dê di demek nêzîk de çap bike.

Her wiha Yara di gelek çalakî û kiryarên hunerî, çandî û (karê jinan) de xebitiye û bi çend hunermend û stranbêjên Kurd li Rojavayê Kurdistan, Herêma Kurdistan û Iraqê re stranên hevbeş bi rengê dukes (duet) û komên stranbêjiyê strandiye û piştî lêkolîn û xebateke dirêj, beşdarî gelek karên hunerî bûye:

1-kilîpeke hevbeş ya bi navê (Qêrîna Hunermendan) ku bal dikşîne ser hevrêzî û yekrêziya gelê Kurd.

2-Kilîpek li ser etnîkên Iraqê li paytextê Iraqê Bexdayê hat amadekirin û bi gelek ziman û zaravayan hat pêşkêşkirin.

3-Kilîpa “Efrîn Kelha Pola “ ku êş , kul û derdên Efrîniyan tîne ser zimên û bibeşdariya gelek hunermendan ji Ewropa, Başûrê Kurdistanê, ji Rojava û Helebê .

4-kilîpa Siwaro ya wê ya taybete ku stranek gelêrî ye bi stîla xwe xwendiye.

5-Kilîpa Rêwiya min ya wê ya taybete ku rêwîtiya jiyanê bilêv dike.

6-Kilîpa Meryem Can ku wê û hunermend Mistefa Hoger bi du zaravan ( Soranî û Kurmancî) gotine .

7-Kilîpa strana (Çar Elî) li herêma Cizîra Rojavayê Kurdistanê hatiye kişandin û pêşxistin Û weke dî beşdarî gelek fastîval , pêşengeh û ahengan bûye çi li başûrê Kurdistanê û çi li Rojavayê Kurdistanê .

8- Bi dengê xwe beşdarî belgefilma bi navê” Efrînê Evînê “ jî bûye .Ew beşdarî gelek helkeftên neteweyî, şahiyên herêmî û cejnên Newrozê bûye û ji stranên wê yên herî navdar ev in:

1-Strana “Rêwiya min” ji gotin û awazên Zakariya Efrînî

2-Strana” Çar alî “ ji gotin û awazên Zakariya Efrînî

3-Strana “Siwaro” ji folklora kurdî

4-Strana lawiko, ji gotin û awazên wê.

Hêjmarek stranên wê yên hazir hene ku ji aliyê Zakariya Efrînî ve hatine awaz kirin û nivîsandin, lê ji ber lêçûna aborî û nekarîna wê ya tomarkirinê ji ber şert û mercên zehmet ên jiyanê, nekarî wan tomar bike û bike kilîp. Bê guman tundiya koçberiyê û koçberkirina bi darê zorê ji Efrînê û nebûna alîkariya aliyên peywendîdar, hin xewn û daxwazên wan ji holê rakir, lê wan hemûyan nekarîn biryar û îradeya wan bişkînin.

Gelek stranên wê yên hazir û ne tomar kirî hene, di nav de:

1-Baran Baran

2-Çelengê Bedewê

3-Tîrêjên Rojê

4-Ezim Taca Zerîn (ji bo zarokan)

5-Di xew de hiştin lorîka min.

Stranên wê stîlê hezkirina welat û xwezayê û her wiha stranên resen ên mîrate û folklorî yên kurdî wergirtine, wê ji bo welat û xwezayê, ji bo yekîtî û berxwedanê, ji bo azadî û şehîdan jî stran gotine. Tevî wan şert û mercên dijwar ên ku malbata wê tê re derbas bûye, koçkirin û gera li çend bajarên Kurdistanî yên Rojavayê Kurdistanê, Herêma Kurdistanê û Iraqê, wê dest ji xebatên xwe yên hunerî bernedaye û xwendina muzîkê berdewam kiriye û demeke dirêj li bajarê Bexda yê di Komela Hunerî ya Dicle de xebitiye û hîn jî di warê huner, dengbêjî û muzîkê de gavên baş diavêje.

Mixabin ji ber koçberiya bi darê zorê di dema dagirkirina Efrînê de, malbata wê koçberî Cizîrê bûye û li bajarê Qamişlo bi cih bûye û di şert û mercên jiyanê yên dijwar re derbas bûne, rewşa wan gelekî hate guhertin û ji ber rewşa siyasî û windakirina ewlekarî, ewlehî û aramiya welat di encama şer, wêranî, koçberî û guhertina demografî de, bi taybet êş û azarên koçberên Efrînê ku ji malên xwe derketin û rastî çarenûseke ne diyar û gelek kêşe û astengiyan hatin, tevî van hemû şert û mercan jî vê malbatê dest ji xebatên xwe yên hunerî, çandî û nirxên xwe yên Kurdewarî bernedaye.

Digel van helwest û demên dijwar de tevî hevjînê xwe hunermend û derhêner Zakariya Efrîn û keça xwe ya hunermenda ciwan Firîşte Efrîn bi huner, stran û muzîka Kurdî re eleqedar dibe.

Herdu zarokên wê (Bihuşta û Surişta) fêrî amarên mûzîkê bûne û bi hev re wek komek hunerî kar dikin û ew bi hemû derfetên xwe yên hunerî û çandî, bi pênûsên xwe yên zêrîn, bi tîpên xwe yên watedar, bi dengên xwe yên şêrîn û bi stranên xwe yên xweş xizmeta gelê xwe û doza xwe dikin ji bo pêşdixistina qadên huner û muzîka Kurdî .

Ji bo derxistina berhemên hunerî yên nû yên afirîner gelek amadekariyên wan hene û roj bi roj di warê huner, stran û muzîkê de hewl didin xwe bi pêş bixin û pêşdeherin.

Hunermend Yara xizmeta huner û stranbêjiya kurdî kiriye, kete dilê girseyên kurd û hezkiriyên xwe û hewl daye ku di nav hezkirên xwe de cihê xwe yê girîng biparêze.

Wê ji gotinên helbestvanên mezin stran gotine û bi stêrên hunera kurdî re stran gotine, stranên wê karekterek netewî, kevneşopî û akademîk standine û ev yeka wê ji gelek hunermendan cuda dike û ev yek jî kir ku bi xurtî bikeve nava dilê bi hezaran gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê. Ez ji wê û malbata wê re di karê hunerî de serkeftin, afirînerî û geşbûnê dixwazim.



## Têbînî



**Derbarê siberoja Kurdan li Sûriyeyê rewşenbîran çi got?**

Kemal Necim

Bi rûxandina rejîma Baisê li Sûriyê re, rewşeke nû li vî welatî çêbû û civaka Sûriyê bi giştî kete pêşberî siberojeke cuda û her beşekî civakî û êdî her pêkhateyeke nijadî û olî li rewşa xwe û çarenûsa xwe dipirse. Kurd jî weke gelekî resen ê Sûryeyê der barê siberoj û çarenûsa xwe de ketine nava gengeşyan û vê mijarê bi berfirehî gotûbêj dikin.

Dawiya hefteyê li bajarê Qamişlo Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê di bin sernavê “Ber bi Sûryeyeke nû ve” panêleke berfireh liderxist. Di panêlê de çend mijarên girêdayî rewşa Sûriyê bi giştî û rewşa kurdan bi taybet bûne rojeva gotûbêjan. Yek ji mijarên panêlê ku weke pirseke arasteyî rewşenbîran hate kirin, pirsa “Nêrîna rewşenbîran der barê siberoja kurdan li Sûryeyê” bû. Di guftûgoyên der barê vê pirsê de nêrînên cuda yên rewşenbîran der barê siberoja kurdan li Sûryeyê derketin.

Beşekî rewşenbîran di wê baweriyê de ye ku pêwîst e Kurd doza dewleteke hemwelatîbûnê bikin, dewleteke sivîl ku rêgeza wê ya sereke tenê hemwelatîbûn be, bê cudahiya di navbera pêkhateyên nijadî û olî û çandî de.

Hinek ji beşdarên panêlê alîgirên sistema federalî bûn, ku divê herêmên Kurdan weke herêmên federal di nava dewleteke yekgirtî de xwe birêve bibe, weke mînaka wê jî herêma Başûrê Kurdistanê û Îraqê nîşan didan. Der barê mijara federaliyê de nêrînên cuda hebûn, hin kesan gotin ku herêmên kurdan ne herêmên xurû Kurd in, lewma dê nimûneya Başûrê Kurdistanê nepêkan be, li şûna wê divê fedraliyeke erdnîgarî ne federaliya nijadî hebe ku sînorê wê çemê Dicle û Feratê be.

Beşekî din jî, bi taybet yên ku bi mijarên mafnasiyê re mijûl dibin, behsa rêgeza (mafê çarenûsê kirin) ku di zagonên cîhanê yên navneteweyî de gelek peyman û zagonên der barê mafê gelen yê çarenûsê de hene. Alîgirên vê derbirînê dibêjin ku pêwîste di makzagona Sûryeya nû de Kurd weke gelekî resen yê welêt bêne naskirin ku mafê wî gelî yê çarenûsê heye li gorî zagonên navdewletî. Êdî ji wê û şûn de Kurd dê çarenûsa xwe bi xwe destnîşan bikin.

Nêrîna herî serdest jî ew bû ku pêwîste sistema heyî (Rêveberiya Xweser) bi hemû awa û derfetan bête parastin û bibe ninmûneya siberoja Kurdan li Sûryeyê. Xwediyên vê nêrînê jî pala xwe didin ezmûna rêveberiyê ya zêdeyî deh salan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Her wiha bû çeneke wiha derkete pêş ku ev ezmûn dikare ji bo herêmên din ên Sûryeyê jî bibe mînak. Lewma hate xwestin ku ev ezmûn were parastin û piştgiriya hêzên leşkerî û ewlekariyê yên ku vê ezmûnê diaprêzin were kirin.

Bi giştî baweriya çîna rewşenbîran ya Rojava bi rêveberiya demkî ya Şamê nayê û di wê baweriyê de ku pêwîste Kurd xwe zû nespêrin sozên vê rêveberiyê bêyî garantiyên misoger. Her wiha hate xwesitn ku Rêveberiya Xweser jî li gorî van guherîn û geşedanên li Sûriyê rû dane, li ezmûna xwe veger, zêdetir guh bide civakê û pêdiviyên xelkî yên jiyanî pêk bîne.

# Bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî têkoşîna gel didome

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê yek ji şoreşên herî girîng yên ku di Rojhilata Navîn de ji bo tevahî mirovahiyê hatiye destpêkirin. Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî tevahî pêkhateyan bê ferq û cudahî di nava xwe hembêz kir û parast.

Têkoşîn Amara/Qamişlo

Li ser Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re 12 sal derbas bûn. Di nava van 12 salan de li Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek bûyerên ku li Rojhilata Navîn de di sed salan de bikarin pêk werin, bi Şoreşa Rojava re çêbûn. Li gel şahî, xweşî, êrîş û tevahî êşên mezin jî gelê rojavayê Kurdistanê bi berxwedaniya xwe ya 12 salî rêya heqîqetê nîşanî dijmin da. Çewa ku şoreşa rojava di nava van 12 salan de dijminê kurdan û dijminê demokrasiyê bi awayekî zelal raxist berçavan di heman demê de wê ji vir û şûnde jî rastiya hêzên navneteweyî û dijminê kurdan bi hemû berxwedaniya xwe zelal bike û derxe holê.

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê yek ji şoreşên herî girîng yên ku di Rojhilata Navîn de ji bo tevahî mirovahiyê hatiye destpêkirine. Di heman demê de yek ji cêwaziyên vê şoreşê ew e ku tevahî pêkhate bi awayekî bêferq û cudahî di nav xwede dihewîne. Ji ber vê yekê heya niha çiqas êrîşên hatine kirin ji gêlên Rojava bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî, li Bakur û



Rojhilatê Sûriyê li hemberî hemû êrîşan tekoşîn dikin û êrîşan bê bandor dike.

Dewleta Tirk û hemû cîhan jî dizane ku bê azadiya jin civak azad nabe. Ji bona wî jî tevlîbûna jinan di Şerê Gelê Şoreşgerî de girînge, di vê çarçoveyê de Berdevka Qada Civakî a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Leyla Hecî ji rojnameya me re axivî.

**‘Şerê gelê şoreşgerî gaveke dîrokî ye’**

Leyla di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Em wekî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo ku Şerê Gelê Şoreşgerî baş nasbikin û pênase bikin pêwîste xwe li ser fikir û felsefeya Rêber Apo rêxistin bikin. Şerê Gelê Şoreşgerî bi xwe jî rêxistinkirine. Wekî ku Rêber Apo jî diyar kiriye ku gavekî dîrokiye ku em li hemberî dagirkeriyê bi hemû netewên xwe, xwe birêxistin bikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dema em mêyze dikin yên ku herê zêde di şer de rola xwe dileyîze jin bi xwe ye. Di nav şoreşê de jin di hemû qadan de komîn û taxan rêxistin kir û bû xwedî helwest û di her qadê de doza parastina mafê xwe kir.”

**‘Civaka rêxistinkirî civaka azade’**

Leyla got ku civaka rêxistinkirî civaka azade li ser vî bingehê herê zede rola jin û ciwanan girînge û wiha dewam kir: “Ji bo ku êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wî bên têkbirin pêwîste di her qadê de jin bibe xwedî rol. Şervanên YPJ îro bi hêz û îradeyek xort di çeperan de li hemberê zîhniyeta dagirker û DAÎŞ’a ku hemû cihan ji navê wî ditirsiya û nedikarî li hemberê wî bisekine îro YPJ bi îradeyek xort şer dike. Ji bo giştî cîhanê bû nimûneyek ku mînaka wî li cîhanê tuneye. Şoreşa Rojava bi saya Sarayan Arînan, Barînan, Avesteya, Zîlanan bû hêviyekî ji bo



tevayî jinên cîhanê. Û di Şerê Gelê Şoreşgerî de bû pêngavek.”

**‘Pêwîste civak xwe li ser esasê Şerê Gelê Şoreşgerî rêxistin bike’**

Leyla bibîrxist ku “Dewleta tirk a dagirker hertim jina bi hêz ji bo xwe wek tirs dibîne û dike hedef, ku tune bike, û wiha anî ziman” pêwîste em wek jin li hemberê êrîşan bi yek dengê axa xwe biparêzin, berdelên ku di şoreşê de hatine dayîn xwedî lê derkevin. Ji bo rêxistinkirina şere gelê şoreşgerî em bikaribin bikevin nav civakê tax tax komîn komîn û pêwîst bike mal bi mal bigerin û civaka xwe li ser vî esasê pênaseya şerê gelê şoreşgerî çiye, perwerde bikin û bidin famkirin ku civaka me li her kolanekî de parastina ax û hebûna xwe bike.”

Leyla di dawiyê de bang li hemû jinan kir û got; “Ji bo parastina axa xwe û mîrasên ku şehîdan emanete me kiriye, bi rihê şerê gelê şoreşgerî xort bikin. Wek jin û ciwan xwe ji bo her qadekî şoreşê amade bikin û li ser bingeha şerê gelê şoreşgerî xwe birêxistin bikin ku her yek jime bibe parçeyek tekoşînê ku din av şoreşê de cîhê xwe bigre.”

# Kevintirîn Bazar û sembola hevgirtina civaka Amûdê

Dilovan kêfo /Amûdê

**Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hebûna gelek cihên gelerî yên kevnar û xwedî taybetmendî, zengîne. Bajarê Amûdê jî bi cihên gelerî yên xwedî taybetmenedî û kevin, navdare. Ji wan cihan ku beriya 100 salî hatiye avakirin bazara Fatorê ye.**

Yek ji cihên gelerî li bajarê Amûdê bazara Fatorê ye. Ev bazar di sala 1929’an de bi hevkariya di navbera hemû pêkhateyên Amûdê hatiye damezrandin. Pêywendiya ku firoşkarên wê bi hev re girêdide heya roja îro jî berdewam e. Firoşkarên vê bazarê jî xwediyê çîrokên kevin, balkêş û dirêj in.

**Sembola jiyana hevbeş ya pêkhateyên cûda ye**

Bzara Fattaura ya bajarê Amûdê di navbera pêkhateyên kurd û xiristiyan de bûye sembola aştî û yekitiya gelan. Ev bajar bi awayekî hevbeş hat avakirin û bû navenda firotina çaw ji bo tevahiya herêmê. Di destpêka avabûna bazarê de, tevahiya dikanan ji axa girê dîrokî yên bi navûdeng Şermola hatine çêkirin. Lê di van demên dawî de hemû firoşkaran dîwar û dikanên sûkê ku ji kelpîçan hatibûn çêkirin, kirin çemento.



Tiştê balkêş ew e ku kurd û xiristiyan li vê bazarê bi hev re dixebitin, herwiha têkiliyên di navbera wan de pir xurte. Derbarê bazara Fatorê ya bajarê Amûdê yek ji kevntirîn firoşkerê ku li bazarê dixebitî Mihemed Xanîsorî ji rojnameya me re axivî.

**‘Ji sala 1974an û heta niha ez li vê bazarê kar dikim’**

Mihemedê Xanîsorî di destpêka axaftina xwe de wiha: “Temenê min 82 Salî ye. Di sala 1950 de em hatin bajarê Amûdê, di sala 1975’an de min dikanek li bazara Fotorê vekir. Min ji wê demê heta niha ez hirbiyên jinan û destmalên mêran difroşim. Ev bazar yek ji cihên herî pîroz dibînim, ji ber ku her dikanek li vê bazarê çîrokek dirêj û balkêş lê heye. Li vê bazarê têkiliya me bi hev re pir xurte, yek ji bo her kesî û hemû ji bo yekî dixebitin. Dema ku ez lê sûkê dinêrim, gelek tiştên kevinar bala min dikişînin û hemû bîranîn li ber çavên min derbas dibin. Destpêkê de ev sûk 36 dikanên ticarî hebûn, lê îro hejmara nêzîkî 90 dikanî ye. Di sala 2019’an de bi alîkariya hemû firoşkaran me ji barastina ji baranê jora sûkê bi tabloyên tûtiyayê pêçan.”

Firoşkar Mihemed Xanîsorî wiha dawî li axaftina xwe anî: “Ev bazar ne tenê ya min û hin firoşkaran e, ya me hemûyan û em bihêvîne Ku em xwedî li hemû cihanê xwe yên kevin derkevin li kevneşopiyên xwe xwedî derkevin, hêviya jiyaneke aram ji bo hemû gelê me yên li her çar parçeyên Kurdistanê dijîn.”

# 50 sal in tenûran çêdike



Navenda Nûçeyan

**Şîrîn Osman a li navçeya Çemçamala girêdayî bajarê Silêmanî dijî, 50 sal in bi çêkirina tenûrên ji axê yên cur bi cur re mijûl dibe. Hewl dide bi riya vî karî çanda kevin a Kurdî biparêze û jinên din jî fêr bike.**

Şîrîn Osman pêncî sal in tenûran çêdike û di temenê 8 salî de ji bo fêrbûnê dema dayik û pîrika wê tenûr çêdikirin li wan mêze dikir û dixwest nan li tenûrê bide. Şîrîn Osman ji bo çêkirina tenûrek baş ya ji axê çêbike axa ji gundê Qûretuwe tîne û got: “Axa navçeya Çemçamalê bi kêrî çêkirina tenûrê nayê. Destpêkê ez axê tînim û piştre dixim nava naylonê û heta du sê hefteyan dihêlim. Di demên berê de jinan tenûr çêdikir ne mêran. Destpêkê em axê tînin û piştre dikin herî ji bo demek diyarkirî, em xwê dixin nav de. Xwê wisa dike ku tenûr xwe bigre nederize. Rasterast em kayê naxinê, ji ber heriya wê reş dike, dema ku em dest bi çêkirina tenûrê dikin, wê demê kayê jî dixin navê da ku zêdetir xwe bigre û qayîm bibe.”

**Werza havînê werza herî baş e**

Şîrîn Osman li gel çêkirina tenûrê, malbata xwe jî bi rê ve dibe û zarokên xwe perwerde dike, da zanîn ku çêkirina tenûrê çavkaniyeke ji bo dahata jiyanê û wiha got: “Xelk ji nanê tenûra ji axê hez dikin. Ev jî wisa dike ku daxwazên ji bo tenûrên axê zêde bibin. Ji navçeyên cuda xelk daxwaza tenûran dikin û ez ji wan re çêdikim. Çêkirina tenûran ne tenê bi awayekî ye, tenûrên kadeyan ji tenûrên nan biçûktir in. Dema herî baş ji bo çêkirina tenûrê werza havînê ye, ji ber ku di zivistanê de ji ber baranê tenûr dereng hişk dibin. Di werza havînê de ji derveyî tenûran ez kuçikê axê jî ji bo çêkirina xwarinê çêdikim.”

**Çanda Kurdî diparêze**

Şîrîn Osman da zanîn ku di werza havînê de rojê tenûrekê ji axê çêdike lê belê di werza zivistanê de du heta sê rojan temam dike û got: “Ez bi awayê parçe parçe tenûrê çêdikim, hemûyan bi carekê çênakim ji bo ku hişk bibe û xwe bigre, piştre parçeyên din çêdikim. Tenûrên min ji yên xelkên din cudatir in. Ez di beşa navê de wisa dikim da ku her kes bikaribe tê de nan çêbike û bizanibe yên min in. Xelk gelek ji tenûran hez dike, ji ber dizanin yek ji çanda kurdewar a kevnar e. Daxwaza min ji jinan ew e ku fêrî çêkirina tenûran bibin, da ku ev çand bimîne û were parastin.”



# ‘Zihniyeta ku HTŞ’ê li ser mezin bûye, nikare hemû pêkhateyên Sûriyê hembêz bike’

Kurdyar Dirê`î diyar kir ku aloziya Sûriyê û Rojhilata Navîn nayên çareserkirin heya ku pirsgirêka kurdan neyê çareserkirin û got: “Pêwîste Sûriyaye siberojê sûriyeyekî nenavendî be, em Sûriyeke demokrat û azad dixwazin.”

Avêsta Menaf/Qamişlo

Ji ber geşedanên bi lez ên li Sûriyê rû didin, bi taybetî piştî rûxandina rejîma Baas, ya baştir ewe ku ber bi zihniyeta avakirina Sûriyeyeke nûjen ve bimeşin. Hevgirtin û yekîtiya gelê Sûriyê di pêşxistina modêla rêveberiyeke nîştimanî ya li ser esasê edalet û wekheviyê pêwîstiyeke dîrokî ye. Di derbarê rewşa heyî ya ku li Sûriyê diqewime piştî ketina rejîma Baas, Endamê Desteya Rêveber ya Navenda Rojava ya Lêkolînên Istratîcîk Kurdyar Dirê`î ji Rojnameya me re axivî.

Kurdiyar Dirê`î di destpêka axaftina xwe de balkişand ser aloziyên li Sûriyê rûdan û wiha got: “Bê guman dema mirov li ketina rêjîma Baas binêrê, ne tiştekî jixweber û tesadifî hatiye, ji encama 13 salan û zêdetir ji aloziya Sûriya ku wekî şoreş destpêkir, li vir jî şerê navxweyî û qirîz di nav xwede zêde kir. Belê Sûriya ne deverekî cuda ye ji Rojhilata Navîn û di heman demê de ne dûrî şerê cihanê yê 3 mîne ku em di nav de jiyan dikin. Ji ber vê yekê hêzên ku derbasî Sûriyê bûn mîna Rûsiya, Îran, Tirkiyê û Amerîka li ser pilanekê derbas bûn, her wiha her ji xwe re temaşedikirin ka wê rewşa Sûriyê ber bi kuve biçe, her kes ji bo berjewandiyê xwe temaşedikir û tevdigeriya. Bê guman em dibînin ku ji sala 2012`an de û heya roja me ya îro hêzên me bi berxwedaniyeke pir mezin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî hemû êrişan li ber xwe dide, yekemîn hêza ku li hemberî Rêveberiya Xweseri-



ya Demokiratîk rawistiya û li dijî wê radibû, Dewleta Tirk a dagirker e, di heman demê de Hêzên hevpeymanî piştgiriya hêzên me yên (QSD) kirin ji bo tunekirina çeteyên DAIŞ`ê.”

**Hêzên navdewletî û heremî HTŞ`ê anîn ser desthilatiya sûriyê**

Kurdyar diyar kir ku tirkiyê dixwaze desthiladariya xwe ya di asta herî bilin de li sûriyê pêkbîne û wiha domand: “Di sala 2023`an de alûziya Sûriyê destpêkir, êdî wekî komên çete hatin avakirin, ev kom jî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatin avakirin û destek ji bona wan hate dayîn. Armanc ji avakirina van koman ew bû ku di Rojhilata Navîn de tevlîhevî û alûzî zêde bibe û dagirkeriya tirk planên xwe li heremê pêkbîne. Li Sûriyê me dît (HTŞ) ku ji komeke tundrew û ji qayîdê parçebû û bi navê Heyat Tehrîr El-Şam li Îdlebê bi cih bû. Ev komên ku ji 27`ê Mjidarê ve dest bi êrişên xwe li Sûriyê kirin bi armanca rûxandina rejîma Baas û bi desteke hêzên heremî û cîhanî desthilatiya sûriyê kire destê xwe de. Li gor em dibînin armanca wan ne helweşîne Eseed bû, ev kom xeteriyek bi xwe re tîne, ne çareserî. Agahiya dewletên navneteweyî wekê Birîtaniya, Amerîkiye û Îsraîl jî hebû û xwe û bi desteka wan xwe gihandin Şamê. Lê gelo bi ketina rêjîma Baas re aloziya Sûriyê bi dawî bû? Di nêrîna me de qirîzeke nû tê destpêkirin, ji ber ku turkiyê raste rast deswerdana sûriyê dike û nahêle aramî li sûriyê çêbibe.”

**Hişmendiya îro li ser desthilatiya sûriyê nikare çareseriyê bi xwe re bîne**

Dirê’î di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Di rewşa heyî ya li Sûriyê de, Colanî heye ku navê xwe guhert û kir Ehmed El-Şeree ku diwaze tîp û piratîka xwe ya berê di bin navê Ehmed El Şeree de bide guhartin û veşartin. Colanî niha dixwaze bi reng û teşeyê xwe yê herî xweşik gelê Sûriyê bide xapandin, lê ger em li dîroka Ehmed El Şeree tameşe bikin Selefî ne, weke ew bawer dikin li gorî şarîata Îslamê tevdigerin. Bê guman ev zihniyet nikare hemû pêkhateyên di Sûriyê de jiyan dikin hembêz bike. Her wiha hemû komên ku bi Colanî re her çiqas bixweazin xwe bidin guhartin, lê ew ê nikaribin werin guhartin ji ber bi sala ye ev li ser heman zihniyetê hatine perwerde kirin.

Li ser vî bingehê weke nêrîna me dema hêzên Navnetewî Colanê anîn Sûriyê ji bo destpêkirina serdemeke nû ye, ew dema nû jî wê gelek hevrakişandina tê de çêbibe wê gelek pevçûn di navbera ev giropên tundrew de çêbibin. Lê di encamê de em ji bîr nekin ku Îsrayîl sûd jê wergirtiye, ji ber Îran ji Sûriyê hate derxitin. Lê bi giştî diu nava van geşedan û guhartinên ku têne çêkirin de her kes dixwaze derbasî Şamê bibe û têkiliyên xwe bi Hikumeta nû re ava bike.”

**‘Di pirojeya Xweseriya Demokratîk de perçekirin nayê qebûl kirin’**

Dirê’î di berdewamkirina axaftina xwe de destnîşan kir ku hebûna xweseriya Demokratîk hevsengiya serdema nûye û wiha pê de çû: “Weke Bakur û Rojhilatê sûriyê bi her awayî ketiye rojevê, him ji aliyê Şamê ve û him jî ji aliyê Tirkiyê ve. Weke ku hatiye dîtin jî dema wezîrê karê derve yê Tirkiyê derbasî Şamê bûye hate diyar kirin ku naxwazin statûyeke Kurdî angu Rêveberiyeke Xweser di herêmê de bê avakirin. Lê ger em li van bûyeran binêrin hebûna Xweseriya Demokratîk hevsengiye ji serdema nû û pêşeroja Sûriyê re. Ji ber ev komên tundrew nikarin hemû gelê Sûriyê di nava xwe de bihewîne û îdare bike, ya din jî eşkereye ku Tirkiyê li pişt van koma ye û her li gorî zihniyeta Osmaniyan tevdigere dibêje Heleb, Şam û nizanim kûder; lê ev serdem ne serdema Împratoriya ye. pirojeya Rojhilata Navîn ya nû tiştê parçekirî parçe bike, ji ber vê yekê jî di Pirojeya Netewa Demokratîk de tu cihê parçekirinê tune ye û armanc ew e ku Sûriyeke demoktratîk ne navendî bê avakirin.”

Kurdiyar da xuyakirin ku heya pirsgirêka kurd çareser nebe, alozî û qirîza Rojhilata Navîn wê her bimîne û di demên pêş de jî wê pirsgirêkên mezintir bi xwe re bîne.

**‘Jiyanekî Demokiratî û aşîtî’**

Kurdyar Dirê`î di dawiya axaftina xwe de tekez kir ku gelê herî zêde dewlet li ser wan komkujî û talankirin dan meşandin kurd in û heya roja îro ev komkujî dewam dike û wiha got: “Piştî hilweşîna rejîma Baas pir nîqaş tê kirin û pirs di serê her kesî de tê avakirin ka wê Sûriyê ber bi ku ve biçe? Piştî ketina Eseed em dibînin ku di ragihandina Tirkiyê de behsa dewleta osmanî û Qudisê dikin, ev piopoganda hemî xapandina ji gelê mislman re û tevgerên Îslam re ye. Her wiha dewleta Tirk a dagirker bi vê rêbazê dixwaze xwe baş derxîne û di bin navê Îsalmiyetê de cihê xwe li Sûriyê çêbike. Wek em analîz dikin ku di Sûriyê de sîstema herî guncaw wê çibe; di dema Eseed de ji ber ku Essed Elewî bû zihniyeta Elwiya di milê hikum û komkujiyên ku li ser gel dan meşandin, pêk anîn. Her wiha niha jî şûna Essed Colanî hikum dide meşandin û vê carê bi zihniyeteke Sunî, Colanî kesayetekî Sunî ye, ew jî bi vê zihniyetê destheledariya xwe û komkujiyan li ser gelê ne li gorî hişmendiya wî be wê bi meşîne. Dema em behsa komkujiyan û talankirinê dikin, bê guman yên herî zêde dewlet li ser wan dan meşandin, kurd bûn û heya roja îro jî ev komkujî dewam dike. Ji ber vê yekê pêwîste sîstematîk ne navendî be, her oldarek û xwedî bawerî jiyana xwe bi rehet bijî, jiyanekî Demokiratîk û aşîtî pêkwere.”

# Berxwedana li Tişrînê: Êrişên dagirkeriyê hatin şikandin

Navenda Nûçeyan

**Şervanên QSD’ê tevahî êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li ser Bendava Tişrînê têk birin, bi dehan çete hatin kuştin, 2 erebeyên zirxî, 10 erebeyên leşkerî yên çeteyan hatin îmhakirin.**

Navenda Ragihandinê ya QSD’ê têkildarî berxwedana li Bendava Tişrînê daxuyaniyek weşand.

Daxuyanî wiha ye:

“Tevî desteka balafirên bê mirov ên Tirkiyeyê û tevî bikaranîna panzêr û obîsên giran jî, lê hêzên me li gelek eniyan windahiyên mezin gihandin hêzên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê; hejmarek çete hatin kuştin, erebeyên wan ên zirxî, cihekî radarê hatin rûxandin û nuqte û kombûnên wan hatin hedefkirin.

Ji êvara roja Yekşemê heya sibeha roja Duşemê ve, balafirên bê mirov ên dewleta Tirk a dagirker bi dijwarî li asîmanên gundewarê Bendava Tişrînê digeriyan. Di heman demê de herêm bi obîsên giran û moşekên grad dihat topbarankirin.

Roja Şemiyê saet 13.00’an ê piştî nîvro, hêzên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişî gundên Elûş û Til Erîş kirin. Hêzên me bersiva êrişê da û erebeyeke veguhestina leşkeran wêran kir. Her wiha kombûneke çeteyan ji aliyê Yekîneyên Şehîd Harûn ve hat hedefkirin. Li vir şer derket ku 2 saetan dewam kir. Bi qasî hatî tesbîtkirin 2 çete hatin kuştin û yên din ji qada şer reviyan. Hêzên me piştî êriş şikandin bi çekên giran li kombûnên wan dan. Lê hejmara kuştî û birîndarên çeteyan û zerarên ku li wan bûne, nehat zanîn.

Erebeyeke leşkerî ya dijmin ku hewl dide ber bi nuqteyên şervanên me pêş de were ji aliyê Yekîneyên Şehîd Harûn ve hat rûxandin. Em ê piştre dîmenê hedefkirina erebeyê parve bikin. Her wiha mayînek bi erebeyeke çeteyan ve teqiya, lê hejmara kuştî û birîndaran nehat tesbîtkirin.

Hêzên me di şer û pevçûnên li Girê Syriatel de 2 erebeyên zirxî yên çeteyan rûxandin û erebeyeke veguhestina leşkeran jî îmha kir, di encamê de hejmarek çete hatin kuştin. Cenazeyên çeteyan hîna li erdê ne.

Yekîneyên Şehîd Harûn bi giştî li 27 nuqete, kombûnerebeyên hêzên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê xistin. Di nav de navendeke




radarê, erebeyeke zirxî, 5 erebe rûxandin û li 21 nuqte û kombûnên çeteyan xistin. Di encamê de hejmarek kuştî û birîndarên çeteyan çêbûn.”

# ‘Rola ragihandina şerê taybet belavkirina agahiyên nerast e’

**Edîtora Rojnameya Ronahî Sûzan Elî diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihandina şerê taybet kiriye dewrê û gelek agahiyê nerast belav dike da ku moralê civakê xirabike û gel teşwîqî revê bike.**

**Amara Baran /Qamişlo**

Şerê taybet di bingeha xwe de îradeya civakê dike armanc, ji pêkanîna vê armancê serî li tevahiya rêbazên qirêj dide.

Dewleta Tirk a dagirker demek dirêje ku li Bakur û Rojhalatê Sûriyeyê li dijî gelên heremê hewildanên qirkirinê dike. Îro jî li bendava Tişrînê dixwaze komkujiyan careke din nû bike. Ev nêzê mehekê ye ku hêzên QSD,YPG û YPJ bi hemû hêza xwe li bendeva Tişrînê berxwedaniyeke bê hempa dimeşînin. Berxwedana şervanan bûye bingeha serkeftinên herî mezin li dîjî dagirkeriyê. Dewleta Tirk a dagirker di çarçoveya şerê taybet û şerê pîsoklojîk de îdîa dike ku bendav bi temamî ketiye destê wan ji bo ku morale çeteyên xwe xort bike çapameniya xwe ya şerê taybet dike dewrê.

Derbarê mijarê de edîtora Rojnameya Ronahî Sûzan Elî axivî.

**Dewleta Tirk ji bo ku şerê taybet bide meşandin bi dehan malper û ajansan vedike’**



Sûzan Elî diyar kir ku Şerê Taybet beşeke ji şerê giştî ye ku sîstemên desthilatdar li ser civakan didin meşandin û wiha got: “Bi armanca rûxandina civakan û pêkanîna berjewendiyên xwe, sîstemên desthilatdar, bi rêbazên cuda şerê taybet didin meşandin. Ji xwe yek ji wan sîsteman jî dewleta Tirk a dagirkere ku îro bi hemû rêbazan êrîşî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Ew bi şerê çekdarî yê li hemberî hêza gelên herêmê yên ku xwe diparêzin li gorî şerê gelê şoreşgerî bi ser nakeve. Ji bo vê jî dewleta tirk a dagirker berê xwe dide şerê taybet ku bikaribe herêmê di rêya vî şerî de dagir bike û demografiya herêmê biguhere. Bi taybet vê yekê pêk tîne di rêya ragihandinê de û ji bo vê bi dehan malper û ajansên xwe vekir û di rêya medyayê de civakê dixapîne.”

**‘Çapemenî hêza civakê ye’**

Suzan Elî wiha domand: “Bê guman çapemenî hêza yekemîn di civakê de ye, ji bo vê jî desthilatdar vê hêzê li gorî bercewendiyên xwe bikartînin û ev çapemenî li gorî sîsteman tevdigere û dikeve bin xizmeta wan de. Ji bilî çapemeniya azad a ku tê naskirin bi çapemeniya şoreşgerî, ev çapemenî li gorî civakê tevdigere, rastiya heyî derdxîne holê û dighêjîne raya giştî, ji bo vê yekê çapemeniya azad rastî pir êrîşan tê ji aliyê sîstemên desthilatdar ve, bitaybet ji aliyê dewleta tirk a dagirker a ku ji pênûsa azad ditirse û ragihandina azad ji bo xwe xeterî dibîne li ser wî esasê ragihandinê hedefdigre ji bo ku destkeftiyên şoreşa 19 ê Tîrmehê têk bibe û rastiya siyaseta xwe û kiriyarên xwe yên ku rojane dide meşandin di herêmên dagirkirî de mîna Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê veşêre û gef û erîşên wê li ser gelên resen ên Rojhilata Navin û qirkirina xwezaya Kurdistanê û bi karanîna çekên kîmiyawî bi taybet li ser gerîlayên azadiyê ji bo vê jî em dibîn ku rojnamevanên çapemeniya azad ji xwe re dikin armanc da ku vê rastiyê ranegihînin raya giştî, di encam de hewil dide ku rê li pêşiya ragihandina azad bigre û di rêya ragihandina xwe de tersî vê rastyê bûyeran belav bike da ku civakê tevahî bixapîne.”

**‘Fulya Ozturk amurekî şerê taybete’**

Sûzan bibîrxist ku dewleta Tirk a dagirker nikarîbû di rêya sîxûrên xwe de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hêza gelên herêmê bişkîne, nihajî giranî daye ragihandina xwe ku xwe xwedî hêz û doze nîşan bide û rojnamevanên wek sîxor didin bikaranîn ji bo ku xeyalên xwe yên Osmanî pêkbîne û tifaqa xwe ya Misaqî Milî pêkbîne di rêya dagirkirina herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yan jî Rojava de, yek ji wan rojnamevan ku di wê baweriyê de ye ku ew nûçeyên derew belav dike, lê dîsa jî li gorî desthilatdariyê tevdigere, Fulya Özturk a ku rojane nûçeyên ne rast belavdike ku lêşkerên tirk bi ser dikevin û her car li deverêkê ye heyanî ku derbasî Helebê bû di dema hilwişandina rejîma BAAS de, ku Heleb bajarekî Osmanî ye. Rojnamevaneke bi vî rengî rojevek berovajî ava dike û civakê dide bibawerkirin û ciwanan dixapîne da ku li ser şopa wê bimeşîn û xwe zêdetir bihêzbikin û artêşeke ji şerê taybet avabike.”

**‘Pêwîste civak li hemberê çapemeniya şerê taybet hişyar be’**

Sûzan Elî di dawiyê de bang li giştî civakê kir û got: “Pêwîste civaka me nekeve xefika çapemeniya şerê taybet û li hemberê çapemeniya şerê taybet hişyar tevbigerin, di serî de jin û ciwan û giştî civak xwe biparêzin, pêwîste destpêkê baldarbin û polîtîkeyan siyaseta dewleta tirk a dagirker baş fêmbikin ku dewleta tirk dewleteke dagirker e, ticar nabe hevalbend, wek meznan gotine “dijmênên bav û kalan ticar nabin dost lawan”, û baldarbin ku şerê taybet piranî li ser medya ferazî tê belavkirin û rastiyê ji saziyên me yên fermî bigrin mîna QSDê, YPJê, û Rêveberiya xweser û xwe xurtbikin di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de, xwe birêxistin bikin.”

# ‘Em Sûriyeke nenavendî û demokrat dixwazin’

**Navenda Nûçeyan**

**Pêkhateyên Bakur û Rojhilatên Sûriyê diyar kirin ku ew Sûriyeke nenavendî demokratîk dixwazin û wiha gotin : “Êdî bese ji kuştin, koletî û zordariyê re, bila êdî her pêkhateyek li ser nasneme, ziman û çanda xwe bê tirs bijîn. Pêwîste mafê hemû jinan jî were dayîn, ji ber ku ew bingeh û pêşengên civakê ne.”**

Bi hilweşîna sîstema Baas û aloziyên ku îro li tevahî erdîngariya Sûrî tê jiyankirin, car din desthilatdariya dewleta Tirk û çeteyên wê êrîşên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê nû dikin û dixwazin axa bi ewle dagir bikin. Ji bo ku Sûriyeke nû bê avakirin û destûrek nû bê çêkirin û mafên tevahî pêkhateyan were parastin, pêwîste tevahiya gelan bi çand, ziman û nasnameya xwe jiyan bikin.

Derbarê siberoja Sûriyê û hedefgiritina jinan, endamê Rêveberiya Meclisa Ol û Baweriyan li Bakur û Rojhilatê Suriyê Hesen Mihemed û endamê Meclisa Ol û Baweriyan yê ku ji pêkhateya xiristiyanî ye Hena Somî ji Rojnemeya me re axivîn.

Hesen Mihemed di destpêka axaftina xwe de balkişand li ser rewş û aloziya ku di Sûriyê de diqewime û wiha got: “Rewşa Sûriya heya niha ti kes bi zelalî nizane çi tê qewmandin, ji ber ku tevlîheviyekî pir mezin hatiye çêkirin. Niha bi awayekî demkî Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) ku cihê Esed girtiye, eger guhertin di xwe de ne din avakirin wekî guhertina hişmendî, wê rewşa Sûriyê ne zelal û tevlîhev be, êdî aştî û aramî têde namîne. Ya din jî ku ev rêveberiya niha di aliyê hişmendiyê de xwe ne de guhertin wê Sûriyê aloztir bebe, ji ber ku gelê Sûriyê ne gelê berê ne ku her hişmendî û dîdaktorî qebûl bikin. Edî gel hişyar bûye ku bê maf û bêpar nemînin. Bi taybetî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ev 13 sal in bi berxwedanî û tekoşînê hatiya meşandin û li ser xwîna bi hezaran şehîdan hatiye avakirin. Ne mumkine ku ev qas şehîd û ked hîn gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê edalet bimînin. Pêwîste di Sûriya nû de yekîtiya gelan û olan hebe û pêşbikefe, rêbazên ku rêjîma Eseed dikir ber dûbare nebin da ku aştî, aramî, yekîtî û bi yek dest Sûriyê qezanc bibe ji aloziyên ku têde derbas dibe.”

**‘Pêwîste Sûriyeke hevbeş be’**

Mihemed diyar kir ku pêwîste Sûriya nû Sûriyekî hevbeş be û wiha domand: “Di Sûriya siberojê de pêwîste hemû ol azad bin, tirs nebe, ferdkirina ola îslamê li ser pêkhateyan tune be, Sûriyeke hevbeş be. Her wiha tê diyar kirin ku rêveberiya Sûriyê a demkî dixwaze hişmendiya xwe li ser gelê Sûriytê bide feriz kirin, ji ber vê yek wê di vê hişmendiyê de ti çareserî bi xwe re nayîne, îro em ne rêvebereiyêkî bi hişmendiya olî dixwazin. Em rêveberiyeke ku bi demokiratî Sûriyê bi rêve bibe. Yanê bi zelaî em dikarin bêjin em rêjîma Eseed careke din naxwazin, ji ber ku destheledarî, bê



Hesen Mihemed

mafî, bê edalet û ferq û cuda bûne di navbera pêkhateyan dida çêkirin. Divê her kes bi çanda xwe eleqdar be, ferq û cûdahî di navbera pêkhateyan tune be, rêzdarî ji bo hemî olên ku di Sûriyê de xwe bi cih dikin hebû.”

**‘Ti kes nikare jiyana jinan tarî bike’**

Hesen Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de palkişand ser ked û tekoşîna jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û wiha got: “Di destpêka Şoreşa Rojava ku bi şoreşa jinê hat nasîn, jin rolekî girîng û serke di nava şoreşa Rojava de leyost, di heman demê de karîbû di hemû qadan de xwe bi cih bike û serkeftinên pir mezin bi destxistin. Êdî ew jina ku ji bo daxwaza mafê xwe bê deng nema, bû xwedî ked, fikir, ked, tekoşîn û berxewdaniyên herî meazin, jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû nimune ji hemî jinên cîhanê re. Gelo en rêveberiya Şamê ya demkî û yê ku were diyar kirin jî, wê bi çi hişmendiyê nêzî jinê bibe û wê çawa di civakê de bide qebûl kirin?, jinên ?Bakur û



Hene Somî

Rojhilatê Sûriyê û bi taybetî jinên kurd ne jinê berê ne ku xwe radestî koletî û jiyaneke ne azad bikin. beriya demekî dîmenek Serokê giştê yê HTŞ`ê Ehmed El-Şeree Colanî hat belav kirin, dema ku jinek dixwaze bi wî re wêneyekî bikşîne, ew qebûl nekir heya ku desmal deyine li ser serê xwe û pore xwe veşêre. Belkî ev nêzîkatî û rêbaz çi dide diyar kirin, dixwazin jin dîsa derbasî jiyana tarîtiyê bikin ku di nava civakê de cihê wê nemîne, her dixwazin ku jin di bin koletoya wan de be, azadiya jinê ji xwe re tiris û asteng dibînin. Ji ber vê yekê ev nayê qebûlkirin, jin jî asla vê hişmendiya ku bi navê îslamê qebûl bike, ji ber ku jina bi vê rêbazî were fetsandin û helandin ne edaleta, pêwîste dewletekî ne navendî be.”

**‘Em Sûriyeke Demokirat dixwazin ne Sûriyeke navendî’**

Di heman çarçoveyê de endamê Meclisa Ol û Baweriyan yê ku ji pêkhateya xiristiyanî ye Hena Somî axivî û wiha got: “Em wekî pêkhateyên xiristiyanî, di dema rêjîma Eseed de bê maf û bêpar mabûn, me jî nikarîbû bi awayekî azad yan jî bi zimanê dayika xwe bi axivin, her tişt bûbû mafê ereban, her kes dixwestin bikin ereb, heya niha gelek xiristiyanî hena bi zimanê xwe nizanin bi axivin, ji ber ku di her derî de zimanê erebî tenê serbest bû, xiristiyanê di Sûriyê de ne dihatin nasîn, ti navendekî girêdayê wan tine bû, tenê dêr hebûn. Di dema rêjîma Eseed de yeyîtî tune bû, her zehniyetekê nejedparast di nava pêkhateyan de didan avakirin. lê bi ketina Eseed gel bi azadiyê hîskir û bi rojên nû pênese kirin. gelo ev rêveberiya Sûriyê ya ku were diyar kirin, wê çawa be? Wê bi çi hişmendiyê gel bi rêvebibe?. Em bi hêviya ku dîsa ew rêjîma tirsenak newe û ew hişmendiya nejedparestî di nava pêkhateyan pêş nekev, ji ber ku ev kesên ku niha wê rêveberiya Sûriyê bikin di aliyê hişmendiyê de pirsgirêk hene, tê xuyakirin ku pêwîste jin di nava kar û xebatên civakê de cih negire û li ser wê hin rêbazên ku bi navê îslamê bidin meûandin, belkî ew nabînin ku ev zêdeyî 2 sal in li Rojhilatê Kurdistan Serhildana Jin, Jiyan, Azadî hatiya destpêkirin, ew jî ji bo vê hişmendiyê bû ku bi hezaran jinan li Îranê hatin qetil kirin, ev hişmendî li Sûriyê nayê qebûl kirin, em Sûriyeke Demokirat dixwazin ne Sûriyeke navendî. Êdî bese ji kuştin, koletî û zordariyê re, bila êdî her pêkhateyek li ser nasneme, ziman û çanda xwe bijî bê tiris. Di heman demê de ji bo hemû jinan jî pêwîste mafê wan ji aliyê dewletan were dayin.”



# Komkujiya 9’ê Çileyê ya Parîsê

**3 jinên Kurd ên şoreşger Sakîne Cansiz (Sara), Fîdan Dogan (Rojbîn) û Leyla Şaylemez (Ronahî) di 9’ê Çileya 2013’an de li paytexta Fransa Parîsê, ji aliyê tifaqa faşîst a AKP-MHP’ê ve bi destê îstixbarata Tirk MÎT’ê ve hatin şehîd xistin.**

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Tevî ku 12 sal di ser komkujiya 9`ê Çileyê re derbas bûye, hîn jî zirxa ‘sira dewletê’ ya li ser dosya dozê nehatiye rakirin. Dewleta Fransayê tevî ku dewleta Tirk a faşîst ji ber vê komkujiyê dadgeh nekir, her wiha zemîn ji rûdana komkujiya duyemîn a Parîsê re amade kir. Komkujiya duyemîn a ku 23’ê Kanûna 2022`an hate kirin, dewama berjewendî û polîtîkayên qirêj ên hikumeta Fransayê û tifaqa faşîst a AKP-MHP’ê ye. Yên ku fermana komkujiyê dan û kujer zelal in, ya ku ne zelal e, edaleta dewleta Fransayê ya li hemberî gelê Kurd e.

**Rêberê Apo komkujiya 9’ê Çileyê weke komkujiya 2`mîn a Dersimê pênase kir**

Komkujiyên 9’ê Çileyê û 23’ê Kanûnê weke parçeyek ji polîtîkayên qirkirinê yên li ser gelê Kurd hatin kirin û li dijî Tevgera Azadiyê ya Jinên Kurd hate birêxistinkirin. Mînaka herî şênber a vê yekê jî polîtîkaya tecrîd û pişaftinê ya li ser Rêberê me ye. Sîstema Îmraliyê nîşaneya şênber a qirikrina Kurdan e.

Rêber Apo komkujiya 9`ê Çileyê weke komkujiya duyemîn a Dersimê pênase kir û bi gotina “Ha we êrîşî Sakîne kir, ha jî we êrîşî min kir’ bal kişand ser armanca komkujiyê.

Komkujiyên yekemîn û duyemîn ên Parîsê ku nîşaneya israra hêzên navneteweyî ya li ser qirkirina Kurdan e, lewma ronîkirina van herdu komkujiyan wê bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bibe. Ji ber vê yekê pêwîste têkoşîn û berxwedanê mezin bibe. Israra li ser paradîgmaya Rêber Apo ku gerdûnî dibe, israra li ser mirovbûnê ye. Mîna Sakîne, Rojbîn, Ronahî û Evîn... Paradîgmaya Rêber Apo ya li dora azadiya jinê, tirs berdaye nava hêzên hegemon, lewma êriş li pêşengên tevgera jinên Kurd tê kirin. Ji ber ku jinên berxwedêr û azadbûyî li dijî dewletên mêr ên kapîtalîst alternatîfê diafirînin, ji bo mirovên ku li ser jiyana bi rûmet û azad israr dikin, dibin ronahî.

**Hedefgirtina jinên şoreşger û pêşeng**

Mirov dikare ev komkujiyê wekî berdewama kombloya navnetewî ya ku li himber Rêber Apo hate meşandin bigire dest, her wiha berdewamiya vê koployê ku xwe di 9’ê Çileya 2013 li dijî şoreşgera 40 salan heval Sara û herdû hevalên hate meşandin û berdewamkirina vê komkujiyê hişker bû ku heta kîjan astê hişmendiya sermayedar û netew dewlet li himber têkoşîna jina azad kûr û bê tehemûle.

Hedef girtina jinên şoreşger û pêşeng ji encama sekna




wan ya leheng e. Ji ber ku ew teybetmendiyên ku di kesayeta xwe de avakirine li dijî pergala dewletan ne, li dijî wê hişmendiya ku hemû rojê jin ji bo berjewendiyên xwe yên deshilatdariyê dixe qurbanî. Ev êriş êrişeke pilankirî ya hişmendiya zayendperst û sermayedar bû. Êrişeke li dijî şoreşa jin jiyan azadî bû.

**Komkujî planeke MÎT’ê bû**

Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez komkujî ji aliyê MÎT’ê ve hatiye pîlankirin û bicihanîn û tê xuyakirin ku tiliya dewleta Fransayê jî tê de heye.

Li dijî hêzên komploger ên êrişî jinan, gelan û nirxên mirovahiyê dikin, wê her jin li ser azadiyê israr bikin. Israra li ser têkoşîna azadiya jinê, israra li ser parçekirina kodên sîstema serweriya mêr. Lewma şoreşa jinê wê tolhildana hemî jinan be.

**Heya roja îro jin tê hedefgiritin**

bi hatina şoreşa Rojava jin pêşengtiyeke mezin di nava şoreşê de da meşandin, îdî bû nemûne ji bo hemî jinên cîhanê ku nema ew jiyana tarî û di bin destê zilanî desthiledar qebûl kir. Her daketin li qadan û dengê xwe ji bo azadiyê bilind kir û daxwaze mafê xwe yê jiyan kirinê û xwezayê kir. Êdî roj bi roj jinên pêşeng gelek serkeftin bi destxistin. Ji ber vê yekê her ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve heya roja îro tê hedef girtin, ji hêza jin û îdolojiya wê di tirsin, li kêleka wê jî her berxwedanî û tekoşîn ji xwe re bingih digirin, tiştek bi navê peskirin nasnakin, ji ber jina îro ne jine berê ye.

## Hêza ku bi navê SMO tê zanîn girêdayî kê ye?



**Zekî Bedran**

Rêveberiya faşîst a Erdogan li Sûriyê hêzeke paramilîter a girêdayî xwe rêxistin kir. Navê wê jî kir Artêşa Niştimanî Sûriyê (SMO). Dema ku rexneyên cuda hatin jî ev hêz wek Quwayê Millî ya Sûriyê binavkir. Quwayê Millî li dijî kê hatibû avakirin? Eşkere ye ku wê demê li Sûriyê hêza dagirker Tirkiye bixwe bû. Di rewşeke asayî de, diviya bû ku ev hêz li dijî dagirkeriyê berxwe bide. Qaşo navê wê Hêzên Neteweyî ye! Her wiha hêzeke neteweyî ji aliyê hêzeke biyanî ve, bi taybetî jî hêzeke dagirker nayê avakirin. Beşên welatparêz ên li dijî dagirkeriyê berxwedanê rêxistin dikin.

Niha êdî bi tevahî eşkere bûye ku SMO girêdayî kê ye û di bin xizmeta kê de ye. SMO ne ya gelê Sûriyê ye. Eşkere ye ku ew hêzeke bi tevahî wek Wagnera ku ji aliyê Rûsyayê ve hatiye damezirandin. Armanca vê hêzê ya siyasî û hedefên wê tune ne. Pêwîst nake ku wek muxalefeta Surî jî were bi navkirin. Eger ev hêz ya Sûriyê bûya, diviya niha li Şamê bûya. Hemû komên di nav HTŞ’ê de li Şamê ne. Rejîma Baas hilweşiyaye, hewldanên avakirina Sûriyeke nû hene. HTŞ hewl dide ku xwe rêxistin bike û dewletê li gorî xwe plansaz bike. Lê SMO li derveyî van xebat û armancên siyasî bi tevahî di bin serweriya hêzên dagirker ên Tirk de êrîşî herêmên xweser dike û hewl dide ku wan ji holê rake. Biryara van operasyonan artêşa Tirk dide. Piştgiriya hewayî, lojîstîk û amûran dewleta Tirk dide û piranî serbazên wê ji generalên Tirk pêk tên.

Dewleta Tirk, Kurd wek dijminê sereke diyar kiriye. Dibêje bila Kurd li tu derê cîhanê nebin xwedî nasname û statû. Herêmên xweser jî bi pêşengiya Kurdan hatin avakirin. Ev der di têkoşîna li dijî DAIŞ’ê de hatin rizgarkirin û bi awayekî demokratîk xwe rêxistin kirin û dikin.

Li herêmên xweser hemû gel, çand û bawerî bi awayekî azad xwe pênase dikin, mînakeke jiyana hevbeş xwe tevger dikin. Ev ji bo Rojhilata Navîn destketiyeke mezin û tevgera ronahiyê ye. Derketina ji qalibên olî û netewperest û wek modêleke ku ji aliyê herkesî ve tê hewandin ji bo Rojhilata Navîn şanseke bêhempa ye. Li şûna ku rê li ber vê çareseriyê veke, Tirkiye xebatên xwe yên ji bo ji holê rakirina vê zêde kiriye.

Dewleta Tirk guhê xwe ji dengên ku ji cîhanê bilind dibin re girtiye. Hemû hêz bang dikin ku li Sûriyê pevçûn bisekinin. Hişyarî û fikarên ku DAIŞ’ê dê ji rewşa kaos û bêîstiqrariyê sûd wergire û dîsa çalak bibe hene. Her wiha tê xwestin ku rejîma nû ya li Sûriyê dê bê avakirin hemû kêmnetew û komên olî bihewîne û kesî dernexe. Lê Tirkiye berevajî vê yekê dike. Bi demagojî dibêje ku guya SMO dixwaze SDG’ê ji rojavayê Firatê derxe û herêmên xweser ji holê rake. Çi pirsgirêka SMO’yê bi Kurdan an jî herêmên xweser re heye? Qaşo li dijî rejîmê hatibûn avakirin, qaşo di nav opozisyonê de bûn. Baas hilweşiya, êdî opozisyona çi ne? Sedemek nemaye ku ew bibin opozisyon.

Herêmên xweser jî li dijî desthilatiya rejîma Baas bûn. Wan opozisyona herî bibandor û pratîk pêk anîn. Tevlî rejîmê nebûn û rêveberiyên demokratîk ên alternatîf ava kirin. Bi tu dewlet an jî hêzên derve ve nehatin girêdan. Tu yê Kurdan bi destê çeteyên ji Çeçenan heta Uyguran û ji DAIŞ’iyên berê heta Birayê Misilman(Ixwanî Muslîmîn) ku benê wan qetiyaye bide perçiqandin, û navê van jî bikî hêza neteweyî!

Hikûmeta Tirk li ser HTŞ’ê jî ferz dike, dibêje bila biyaniyên di nav SDG’ê de derkevin. Mebest ji vê Kurdên Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê ne ku ji bo şerê li dijî DAIŞ’ê hatine alîkariyê. Kurd li Sûriyê wek biyanî tên nîşandan. Lê di nav HTŞ û SMO’yê de bi hezaran netewên Uygur, Çeçen, Ozbek û yên ji welatên cuda hatine hene. Tirkiye qet behsa wan nake, lê tenê dibêje Kurd biyanî ne û bila ji Sûriyê derkevin. Her wiha, wek ku tê gotin ewqas Kurdên ji derve hatine jî tune ne. Piraniya yên ku ji bo şerê li dijî DAIŞ’ê hatibûn jî vegeriyan. Li vir tiştê ku divê bê dîtin dijminatiya bêsînor û şerê psîkolojîk ê dewleta Tirk e.

Artêşa Tirk hêzên bi navê SMO gelek xerab bi kar tîne û wan dişîne mirinê. Çawa be leşkerê wan namirin, çiqasî zirarê bide Kurdan ji bo wê ewqas qezenc e, dema ew dimirin cenazeyên wan naçin Tirkiyeyê. Yên ku di nav SMO’yê de şer dikin ji bo artêşa Tirk kêmtir mesref in. Jiyana wan bi erzantir diqede. Cenazeyên piraniya wan jî nayên rakirin, xwedîderketiyên wan jî tune ne. Li şûna ku leşkerê wan bê êşandin û bimirin, şandina van hêzên devşîrme bo mirinê bêhtir bi kêr tên.

Ji vî alî ve divê SMO bi tu awayî wek hêzeke Sûriyê an jî opozisyonê neyê dîtin. Ew bi tevahî leşkerên kirêgirtî yên dewleta Tirk in. Ew ji bo Sûriyeyê şer nakin. Bi tevahî di bin emrê dewleta Tirk de û ji bo berjewendiyên wê dişînin mirinê. Tê gotin ku komên çekdar ên li Sûriyeyê dê çekan deynin û tevlî artêşa ku dê bê avakirin bibin. Lê SMO li gorî vê tevnagere. HTŞ jî temaşe dike. Tê dîtin ku HTŞ ji bo êrîşî herêmên xweser bike bi dewleta Tirk re li hev kiriye. Herî kêm tê fêmkirin ku Tirk vê ferz dikin. Dewleta Tirk dixwaze SDG’ê belav bike. Vê li ser Amerîka û hevpeymaniyê jî ferz dike. Dibêje girtîgehên DAIŞ’ê an radestî me an jî radestî HTŞ’ê bikin. Ev tê çi wateyê? Eger radestî HTŞ’ê bibe, diyar e ku dê hemû bên berdan. Eşkere ye ku DAIŞ ji aliyê dewleta Tirk ve asta metirsîyê de nayê dîtin. Ji xwe her tim ji wan re di nav hevkarîyê de bû. Hemû cîhan dibêje xetera DAIŞ’ê zêde bûye lê dewleta Tirk propagandayê dike û dibêje “Amerîka dixwaze bi hinceta xetera DAIŞ’ê li Sûriyê bimîne û piştgiriya PKK’ê bike!” Tê dîtin ku dijminatiya Kurdan gihîştiye ku derê!

## Bapîrê xwe teqlîd nekin!



**Farûk Sakik**

Li Tirkiyê di van demê dawî de bi destpêkirina hevdîtinên bi Rêber Apo re, gotin û hevokên nijadperestî belav dibin. Rayedarên dewletê kî behsa pêvajoyê dike, bi peyva ‘teror’ dest bi axaftina xwe dike. Bahçelî, Erdogan û hin rayedarên din. Ji bo dilê nijadperestên Yozgat û Çorûmê xweş bikin vê peyvê bi kar tînin. Xema wan nîne ku Kurd bi vê yekê aciz dibin yan na?

Herî dawî axaftina Erdogan a “serdema terorê bi dawî dibe û serdema biratiyê dest pê dike” rojnameya Milliyetê derxist manşeta xwe. Xwişk û biratiya van herdû gelan hebû. Bapîrê we dest bi terorê kirin û ev yekîtiya Kurd û Tirkan berteraf kirin. Piştî Lozanê bapîrên we har bûn. Terora we li ser çand, ziman, huner û nasnameya Kurd roj bi roj zêde bû. Piştî serhildana Şêx Saîd terora ku wan li Kurdistan meşand hed û hesabê wî tunebû. Bi ‘plana îslahkirina Şerqê’ Kurdistan wêran kirin. Bi terora bapîrên we yên guhertina navê bajar, gund û herêman re navê gundê min(F.S.) Zengok we danî Yurecîk. Teror-komkujiyên bapîrên we yên, li Dersim, Agirî li geliyê Zîlan birînên mezin li gel Kurdan çêkirin.

Bapîrê we Mustefa Muglali dema 33 Kurd ê bêsûc û guneh qetil kir, we navê wî li baregehên leşkerî kir. Dema ku di sala 1993’yan de eskerê we li Mûşê li bajarokê Vartînisê ji malbatek 9 kes bi saxî şewitand dengê kenê eskerê we û qîrîna wan zarokan bi hev re bilind dibû. Dema balafirên we li Roboskî 34 zarokên Kurdan qetil kirin, Erdogan pîlotên balefiran pîroz dikir.

Ev çend kiryarên terorîst ê we û bapîrên we bûn. Terora ku hûn li Rojava dimeşînin ji xwe cîhan jê re şahidî dike. Ev Kurd û tevgera Kurdan ya azadiyê, ji bo vê terora we bide seknandin têkoşiyan. Yek rê hebû ku vê terora we bide seknandin ew jî çek bû. Egîd di sala 1984’an de ev yek bi bîra we xist. Min evqas kiryarên we yên terorî bi bîr xistin. Ka hûn jî yek çalakiyek Kurdan a teror were binavkirin bêjin. Rêber Apo û tevgera azadiyê bi salane ji bo ku aşitiyek mayende pêk were têdikoşin. We tirsek di nav civakê de afirandibû; welat were parçekirin. Wê civakê jî bawerî anîbû. Civaka Tirkiyê, ji we nan, edalet, hiqûq nedixwest. Îroj israra we ev yeke. Her tişt li aliyekê hûn çima êrîşî Rojava dikin. Ji wêderê berbi welatê we talukeyek biçûk heye gelo? Na. Hûnê vê terora xwe ya li dijî Rojava çawa îzah bikin.

Heger hûn dixwazin ku pêvajoyek nû bidin destpêkirin. Heger we ferq kir ku li dijî Kurdan terorê pêk tînin encam nagire, divê zimanê xwe qontrol bikin. Tu kes vî mafî nade hûn li dijî Kurdan û tevgera Kurdan vê peyva terorist bikarbînin. Li aliyekê bi rêberê vî gelî re hevdîtinên we hene, lê li aliyê dinan jî, di helwesta xwe ya nîjadperestî de bi israrin. Gefa herî dawî ji Erdogan hat, dibêje ‘heger çeka xwe binax nekin wê binax bin’. Hefta bihûrî min nivîsî bû; Kurdan rext û çekê xwe li dîwar daliqandine. Heger terora we dewam bike, Kurd wê neçar bimînin ku dîsa serî li wê çekê bidin. JI bo çek were binax kirin di doza Kurdistan de çi pêş ket? Rêber Apo li ser navê gelan, li wê derê bi were wê dest bi muzekereyan bike. Di demek wiha de şert dayin niyeta xirab îfade dike. Em şiyariyek bidin. Heger hûn dixwazin pêvajoya biratiya herdû gelan bidin destpêkirin, wan bapîrê xwe yên ji Lozanê vegeriyane, teqlîd nekin.